

JI GELÊN ME Û RAYA GIŞTÎ YA ŞOREŞGER RE

Di serî de emperyalîzma Amerîkayê, xulamê wê olîgarşiya Tirk û dewletên hevkar ên faşîst ên weke Erebiştana Siûdî, Qatar û Îsraîl, jib o berjewendiyên xwe, bi polîtîkayên hovane dixwazin Rojhilata Navîn sererast bikin. Eniya hevkar a emperyalîst a ku di vê çarçoveyê de çeteyên DAIŞ'ê ava kirin û xwedî kirin, her cûre alîkariyê didin van çeteyên faşîst û dibin hevkarê komkujiyeke din.

Bi destê hêzên emperyalîst ên ku Mafê Diyarkirina Çarenûsa Xwe ya Neteweyannapejirînê û bi destê pêlîstokên wan û partiya serdest a olîgarşiyê AKP'yê, lêyîstokên xwe yê qirêj derdixin hole. Gelê leheng ê **Kobanê**, li hemberî DAIŞ'a ku ji hêla AKP'yê ve tê destekkirin li ber xwe dide. Lê olîgarşiya dewleta Tirk, bi biryar e ku wan ji komkujiyê derbas bike. Sê aliyên Kobanê hatiye dorpeçkirin, dewleta Tirk jî leşkerên xwe ji deriyê Murşîdpînarê vekişandin û ev qad ji DAIŞ'ê re hiştin da ku dorpeçkirina Kobanê ya ji çar aliyan ve, hêsantir bibe. Ligel van lêyîstokên qirêj jî gelê Kobanê, bi pêşengiya YPG û YPJ'yê bi lehengî li ber xwe dide.

Di nava sînorên welatê me de jî, pêkutîya pergala olîgarşîk û faşîst her roj tundtir dibe. Hikûmeta ku li hemberî berxwedana gelê me ya di vê mijarê de hemû amûrên tundiyê xistin meriyetê, li Kurdistanê jî rewşa awarte ragihand. Gel, rewşa awarte yak u ji hêla hikûmetê ve hatiye ragihandin nas nekir û doh, di dirêjahiya rojê de çalakiyên xwe berdewam kirin. Li hemû bajar, navçe, tax û kolanên Kurdistanê gel, bênavber çalakiyan dike û dibêje **Kobanê** ne bi tenê ye. AKP, bi leşker, polîs û dûvikên xwe hizbûl-konrayê re bi çekan êrîşî gel dike. Kontrayên dewletê yê DAIŞ'î yê polîs, 23 hemwelatîyên me qetil kirine.

Gelê me di serî de li Kurdistanê, li seranserî welat

berxwedaneke bi rûmet dimeşîne û her derê dike Kobanê. Gel drûşmeya “her der Kobanê, her der berxwedan” diqîre. Ev şerê hebûnê yê mezin ê ku bi milyonan mirov beşdar bûne, ji niha de mohra xwe li dîrokê xistiye û geşadanên ku pêk tên nîşan didin ku di serî de Tirkîye, hesabên Kobanê yên gelek hêzên navneteweyî û herêmî xera bûn.

Roj, ew roj e ku ji bo Kobanêya ku di binê êrîşa çekên giran, tank û topan de ye, em derkevin kolanan. Roj, ew roj e ku em ji hevkarên û ji herkesên ku bi wan re tevdigerin hesabê bipirsîn. Ev şer, şerê me ye!

BIJÎ BERXWEDANA ME YA ROJAVA Û KOBANÊ

BIJÎ HEVGIRTIN Û BIRATIYA GELAN

8'ê Cotmeha 2014'an

MLSPB/ENIYA ŞOREŞÊ

Wergera Ji zimanê Tirkî: [Aram Alî](#)